Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :963 15-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Li her derî Kurdî!

**Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî, di çarçoveya 15'e Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de li Qada Bajêr ya navçeya Peyasê ya Amedê "Platforma Ziman" danî.**

Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî, di çarçoveya 15'e Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de li Qada Bajêr a navçeya Peyasê ya Amedê "Platforma Ziman" danî. Komeleya Çand û Zimanên Mezopotamyayê (MED-DER), Komeleya Çand û Hûner a Dîcleyê, Ma Music, Komeleya Wêjevanên Kurd, Partiya Heremên Demokratîk (DBP), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Cemaweriyê (KESK),Sendîqeya Kedkarên Perwerde û Zanistê (EGÎTÎM-SEN) û Parlamenterê HDP yê Amedê Îmam Taşçier tevli bernameyê bûn.

Di platformê de ji bo axaftina bi Kurdî gazî li gelê Kurd hat kirin û bername bi strana "Zimanê Kurdî" û çepikan dest pê kir.

Destpêkê Hevserokê MED-DER'ê Rifat Ronî got, bi salan e zimanê Kurdî ji mafê pêrwerdehiye bê par



tê hiştin: "Derfeta perwerdehiya zimanê dayikê ji bo zimanê Kurdî nehatiye dayin, ji ber we jî zimanê Tirki li ser bi milyonan zarokên Kurd hatiye ferzkirin. Ji bo ku em vî mafê bingehîn bi dest bixin, em van çalakiyan li dar dixin."

Piştre berdevke Platforma Zimanê Kurdî Şerefxan Cizirî, Hevserokê DBP'ê yê Rezan a Amedê Hayrettîn Altûn, Nûnere KESK'ê yê Şaxa Amedê Firat Çelik û mamosteyê MED-DER'ê Nesîp Gultekîn jî axivîn û ku ji bo ku zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê bang kirin. Endama Komeleya Wêjekarên Kurd Fatma Tunç jî helbest xwendin.

**Dewlet ziman qir dike**

Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Îmam Tasçier jî bal bire ser zextên li ser zimanê Kurdî û got: "Dema em di meclîsê de bi Kurdî diaxivin, mîkrofona me digrin û dibêjin bi zimanê 'X' axiviyê. 'X' tê we maneyê ku ew ziman miriye. Dewlet polîtikayên bişaftine li ser zimanê kurdî dimeşîne. Heke statuya zimanêkî tine be, ew ziman ji mafê perwerdehiyê jî bêpar tê hiştin. Ji ber wê jî em bang li gelê xwe dikin û dibêjin xwedî li zimanê xwe derkevin."

Piştî axaftinan mamosteyê zimanê kurdî Mazhar Aktaş bi awayekî temsîlî dersa zimanê Kurdî da. Bernameyên Cejna Zimanê Kurdî heta 16'ê Gulanê dewam dikin.

*MA/AMED*

# Şertên tevlîbûna Mihrîcana 6. ya Osman Sebrî ya Wêjeyê

**Desteya Çandê ya herêma Cizîrê û Dîwana Wêjeyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê amadekariya lidarxistina Mihrîcana 6. Ya Osman Sebrî ya Wêjeyê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê û Kurdistanê, dike.**

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Bi zindîkirina bîranîna rewşenbîrê Kurd ê şoreşger Osman Sebrî, Desteya Çandê ya herêma Cizîrê bi hevkariya Komîteya Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dê 11`ê Cotmehê Mîhrîcana Osman Sebrî ya Wêjeyê ya 6`emîn li dar bixe.

Helbestvan û nivîskarê Kurd Osman Sebrî sala 1905`an li gundê Narincê yê Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye û di sala 1993`yan de koça dawî kiriye. Apê Osman nivîskar, helbestvan, zimanzan û siyasetmedarekî Kurd bû û jiyana xwe di xizmeta doza kurdî de borandibû, bi taybetî jî li Rojava.

**ŞERTÊN BEŞDARÛNA MIHRÎCANÊ**

Komîteya Amadekar a 6`emîn Mîhrîcana Osman Sebrî ya Wêjeyê şertên tevlêbûna mîhrîcanê diyar kirin. Şertên beşdarbûnê wiha ne; tenê roman têne qebûlkirin, divê hejmara gotinan ne zêdetirî 20 hezar peyv be, divê temenê beşdar ne kêmî 18 saliyê be, divê tevlêbûn bi zimanên kurdî, erebî û suryanî be, her nivîskarek tenê bi romanekê dikare tev lê bibe, divê berhem berê li tu deveran nehatibe weşandin, her wiha hin şertên teknîkî jî hene.

**BERNAMEYA MIHRÎCANÊ**

Endamê Komîteya Amadekar a Mîhrîcana Osman Sebrî ya Wêjeyê ya 6`emîn Ebdulmecîd Xelef li ser bernameya mîhrîcanê, wiha got: "Mîhrîcana îsal dê gelek çalakiyên çandî û hunerî cih tê de bigirin, wek dayîna semîneran, lidarxistina panelan, xwendina helbest û kurteçîrokan, serdana gora Apê Osman Sebrî û pêşbirka romanên beşdar bûne."

Têkildarî sedemên beşdarbûna bi romanan tenê, Xelef ev tişt anîn ziman: "Destpêka çalakiyên mîhrîcanê me hemû berhemên wêjeyî qebûl dikir, lê di dewreya 5`emîn a mîhrîcanê de tenê kurteçîrok bûn. Îsal jî me xwest balê bikişînin ser romanan da ku hîn bêhtir di nav civaka me de were belavkirin."

Xelef diyar kir ku di romanê de nivîskar bi awayekî berfireh dikare hestên xwe binivîse, her wiha pirsgirêk û aloziyên civakê radixe pêş çavan.

**'NIVÎSKAR DI HILBIJARTINA MIJARA ROMANA XWE DE SERBEST E'**

Xelef da zanîn ku armanca wan ji lidarxistina Mîhrîcana Osman Sebrî ya Wêjeyê ew e ku xwendin di nav civakê de bibe çandek û pêş bikeve, nexasim




çanda xwendina bi zimanê kurdî da ku ji helandinê were parastin. Xelef diyar kir ku di dewreya 5`emîn a mîhrîcanê de hejmareke baş ji berhemên zimanê kurdî hebûn û hêvî kir ku îsal hîn zêdetir be.

Ebdulmecîd Xelef di dewama axaftina xwe de got: "Komîteya nirxandinê ji kesên pispor ên ji hundir û derveyî Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tê. Par mijara nivîsandina kurteçîrokê hate diyarkirin ku ew jî (Çîroka Şoreşê) bû, lê îsal nivîskar di hilbijartina mijara romana xwe de serbest e."

**DAWIYA MiHRÎCANÊ**

Ebdulmecîd Xelef anî ziman ku deriyê tomarkirinê heta 20`ê Tîrmeha 2022`an vekirî ye, da ku komîteya nirxandinê hemû romanan bixwîne.

Komîteya Amadekar a Mîhrîcanê diyar kir ku ew ê xelat li romannivêsên zimanên kurdî, erebî û suryanî werin belavkirin, ji bo yê asta yekemîn dê pere were dayîn û pirtûka wî/wê were çapkirin, ji bo yê asta duyemîn jî dê pirtûka wî/wê dê were çapkirin.

*ANHA*

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ajel | Lawir, candar, heywan. |
| Bûro (Fransî) | Nivîsgeh, odeya xebatê, ofîs. |
| Bûrokrasî (Fransî) | 1.Koma rêveberên dewletê yên asta wan li jorê.<br>2.Meşandina karê rêveberiyê: Ji ber bûrokrasiya giran plana me nemeşiya. |
| Fermanber | Kesê di karê dewletê de bi mûçeyê dixebite, memur, mûwezef. |
| Fon (Fransî) | Diravên ji bo bikaranîna karekî diyar hatîn cudakirin, çavkanî: Ji bo piştgiriya mamosteyan fon hat veqetandin. |
| Kargeh | Ciyê ku kar lê tê kirin. Paloke, fabrîqe, memele. |
| Karmend | Xwediyê kar, karbidest. |
| Moçik | Tasa ji dar hatî çêkirin. |
| Mûçe | Mehaneya ji bo kesên kar dikin tê dayîn. Meaş. |
| Nakokî | Tiştên dijberî hev: Di navbera wan de nakokî derket. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | I | R | ■ | L | A | ■ | A | S | A |
| 2 | L | ■ | | ■ | K | A | W | A | ■ |
| 3 | A | A | ■ | D | A | D | ■ | R | A |
| 4 | M | ■ | L | E | M | ■ | Q | ■ | M |
| 5 | ■ | B | ■ | M | ■ | Z | E | N | E |
| 6 | N | Î | V | ■ | S | E | R | A | D |
| 7 | A | R | ■ | B | A | B | A | N | ■ |
| 8 | ■ | O | X | ■ | M | Û | Ş | ■ | M |
| 9 | T | V | ■ | T | Î | R | ■ | T | Î |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 2 | | | | | | | ■ | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | ■ | | | ■ |
| 4 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 5 | | ■ | | | | | | | |
| 6 | | | ■ | | | ■ | | ■ | |
| 7 | | | | ■ | | | | | |
| 8 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 9 | | | ■ | | | | ■ | | ■ |

**ÇEP-RAST**


1. Îşaret, şop... Felaket, karesat
2. Cihê ku kar û çalakiyên ramyarî, civakî, çandî û hunerî lê tên birêxistin, merkez... Notayeke muzîkê
3. Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Agir
4. Nîşandeka ku dengan dide xuyakirin, mirov çawa li amûrekê dixe û distrê... Kar û xebat
5. Zanista ku li ser çêbûna çiyayan dixebite
6. Yezdanekî misrî... Cejn, eyd
7. Organê bihîstinê... Heta hetayê
8. Baneşana bêhntengiyê... Mehek
9. Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.... Temen

**JOR-JÊR**

1. Rojek... Kulîlkek
2. Bajarekî me... Kurtebêja zêr
3. Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin
4. Mîrîtiyeke kurdan... Kurteya elementa hesin
5. Peyva neyînî... Beşeke malê, jûr
6. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Sarincên avê yên di binê erdê de
7. Dema mirinê
8. Bajarekî me... Keç
9. Nexweşiyek... (Qesrî ...) Bi vê peymanê welatê kurdan bû du parçe

# `Kesên li herêmên dagîrkirî tên bicihkirin tev Erdoganî ne`


Ji bo kiryarên Tirkiyê yên nû û projaya avayiyên mêtîngeriyê li herêmên dagîrkirî endamê Kombenda Efrînê Ya Civakî Emîn Mihemed got, bicîkirina çeteyan û avakirina avayiyên mêtîngeriyê kiryarên dijmirovî ne. ***R-4***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 963 15-Gulan- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Piştî rizgarkirina Tebqa, rewşa jinan ji koletiyê veguherî pêşengiyê

Piştî bajarê Tebqa ji çeteyên DAIŞ`ê hat rizgarkirin rewşa jinên wê hat guhertin. Cilên reş ji ser xwe avêtin û parastina bakur û rojhilatê Sûriyê kirin. ***R-3***



# ZIMAN BI XWEDÎDERKETINÊ TÊ PÎROZKIRIN!

Zimanê me ku nasname, rûmet û hebûna me ye, bi axaftin û wêjeya devkî hatiye parastin. Lê di roja me ya îro de bi vê rêbaza kevin parastina wî ne pêkan e. Lewre amûrên bişaftin û qirkirinê ketine, her gund, bajarok, navçe û bajarên me. Di heman demê de ketina berîk û hundirê malên me. Li aliyê din êdî dayîkên ku ji bilî kurdî ti zimanên din nizanin zarokên bi kurdî nizanin mezin dikin. Ev êş û nakokiyeke mezin e.




## `Ziman ew hêmena ku dihêle civak li ser lingan bimîne`

Cejna Zimanê Kurdî Pîrozbe




Bi pêmana Roja Zimanê Kurdî mamosteya ziman Necbîr Elî got, pêwîst e zimanê kurdî ne zimanê perwerdeyê tenê be, yê bazarê, danûstandinê û yê civakê be. Da ku tevayiya rojên salê bibin roja zimanê kurdî, herwiha bang li gel kir ku, li ked û mîrasa heyî xwedî derkevin. R-5

## Li herêma Cizîrê çandinî di çi rewşê de ye?

Ji ber kêmbarîna baranê, îsal zeviyên bejî pir xerab in. Lê zeviyên avî rewşa wan baş e û ji bo hatineke baş, alîkariya cotkaran didome. ***R-6***



## "Zimanê Kurdî" bi zarokan xweş e



Di çarçoveya 15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de li navçeya Bismilê ya Amedê ji bo zarokan bernameyeke ziman û çandê hat lidarxistin. ***R-7***

## 383 sal ji parçekirina Kurdistanê…avakirina dîwaran têkçûyîna dagîrkeran nîşan dide

Dewletên dagîrker ji Qesra Şîrîn heta avakirina dîwaran, israra wan di konsepta qirkirina gelê Kurd de eşkere dike, herwisa têkçûyîna wan li hemberî têkoşîna gelê Kurd nîşan dide. ***R-4***



## QSD'ê idîayên Wezareta Parastinê ya dewleta Tirkan derew derxistin


QSD'ê ragihand ku nûçeyên ji aliyê Wezareta Parastinê ya dewleta Tirkan ve derketine ku êrişa li ser Karkamişê dispêrin hêzên wan derew in û got, artêşa Tirkan van derewên xwe dikin bingeh û êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike. ***R-2***

## Wesiyeta şehîd Ronahî Kobanê ji jinan re çi bû?

Şehîd Ronahî Kobanê, xwediya têkoşîna her kesê pê re maye şahid e. Ronahî Kobanê pêşengên jin yên şoreşa Rojava weseyet kir ku têkoşînê xurt bikin da şoreş bi ser keve, ango şoreşa jinan bi ser keve. R-3



## Deng û awaza şoreşa



Şehîd Hozan Mizgîn (Gurbet Aydin) yek ji hunermendên Kurd yên şoreşger e û hunerê şoreşgerî û neteweyî pêş xistiye. ***R-7***

**Şeva Çaran û Şerê Tunêlên Kato**

Faruk Sakik

***R-5***



**Mezinkirina berxwedanê şertekî hebûnê ye**

Idrîs Henan

***R-4***



# ‘Dewleta Tirkan dixwaze demografiya bakurê Sûriyê biguherîne’

**Komek ji partiyên siyasî û saziyên civaka sivîl hewldanên dewleta Tirkan ya guhertina demografiya herêmên Sûriyê yên dagîrkirî şermezar kir û bang li hêzên niştîmanî yên sûrî kir ku erkê xwe li hemberî planên ku dixwazin yekîtiya gelê Sûriyê parçe bikin, pêk bînin.**

Partiyên siyasî û saziyên civaka sivîl têkildarî planên dewleta Tirk a dagirker ku dixwazin demografiya herêmên dagirkirî biguhêrin daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyekê de hate gotin: “Di demekê de ku em teqezî li ser mafên xwezayî yên vegera tevahî sûriyan li ser xaka wan dikin, em teqez dikin ku ev proje yek alî ye û dûrî hewldanên navneteweyî yên hevbeş ên bi armanca çareserkirina aloziya Sûriyê bi awayekî adilane ye”

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku armanca hikumeta AKP’ê ya bi bicihkirina sûriyan li ser xeta sînorî ya bakur siyasî ne ji bo hilbijartine û wiha hate domandin: “Ev gav hemû hewldanên niştimanî û neteweyî yên ji bo çareseriya siyasî asteng dikin, di heman demê de dûrxistin û paşguhkirina îradeya sûriyan û hêzên siyasî yên ku nûnertiya wan dikin e.
Ev gav tevgerek ji bo têkbirina endezyariya demografiya Bakurê Sûriyê ye. Ev yek gefê ji pêşeroja yekitiya niştîmanî û aramiya civakî li Sûriyê dixwe. Her wiha vegerandina penaberên Sûriyê bi darê zorê binpêkirineke ber çav ji qanûna navneteweyî û mirovî re ye nexasim ku ev herêm di rastiyê de ne ewle tenê di nêrîna AKP`ê de ewle ne.”

Di daxuyaniyê de bal hate kişandin ser êrişên dewleta Tirk ên 22`ê Nîsana borî li dijî Kobanê û wiha hate gotin: “ Êrişên dawî yên 22’ê Nîsanê li ser Kobanê û êrişên domdar ên li ser herêmên kurdan ên Sûriyê yên bi hinceta parastina ewlehiya neteweyî ya Tirkyiê xeteriyeke mezin li ser hebûna neteweyî ya kurdî ye. Her wiha berdewama siyaseta koçberkirina sîstematîk a li dijî welatiyên Kurd ên li Efrîn, Serêkaniyê nexasim ên li dijî baweriya êzidiyan e.”

Di daxuyaniyê de bang li hêzên siyasî û saziyên sivîl hate kirin ku erka xwe li hember planên ku dixwazin yekitiya gelê Sûriyê parçe bikin, dixwazin mayînan di hevgirtina niştîmanî û civakî de, pêk bîne. Her wiha bang li desteyên mirovî û hêzên rizgarî û demokratîk hate kirin ku ji bo dîtina çareseriyekê ji azarên gelê Sûriyê û ji bo misogerkirina azadî wê û serweriya wê li ser tevahî xaka Sûriyê



bi lez têkeve tevgerê.
Hêzên siyasî yên ku daxuyanî îmze kirine:

Komîteyên Demokratîk ên Sûriyê (Amarcî)
Meclisa Êzidîyên Sûriyê
Şepêla Çep a Şoreşger a Sûriyê
Azadxwazên Serbixwe yên li Çiyayê Ereban
Tevgera Çeksazî- Sûriyê
Rêxistinên Civaka Sivîl:
Komeleya Jiyan a Têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê
Dengê Famînistên Kurd
Koma Xebatê ya ji bo Efrînê
“Act for Afrin”
Navenda ‘’Lêkolîn’’ a Lêkolînên Qanûnî
***ANHA***

# Nasnameyên 2 gerîlayên li Zapê şehîd bûyîn hatin eşkerekirin

**HPG’ê nasnameyên 2 gerîlayên li Zapê şehîd bûyîn eşkere kirin û got, “Sekin, têkoşîn, şerkerî, wêrekî û fedayîtiya her du hevriyên me wê timî rê nîşanî me hevriyên xwe bide û bibe egere me ya ji bo tolhildan û serketinê.”**



Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê wiha ye:

“Gelê Kurdistanê bi Şerê Gel ê Şoreşgerî gav bi gav ber bi serketinê ve dimeşe. Dewleta Tirk a qirker mêtinger, ku dixwaze pêşî li serketina têkoşîna me bigire, hewl dide Kurdistanê ji nû ve dagir bike, dest bi sefera dagirkeriyê kiriye. Êrişa herî dawî ya dijmin a ji bo dagirkirinê ku 14’ê Nîsanê destpê kir, bersiva herî mezin ji jinên azad û leheng ên Kurdistanê yên bi nasnameya YJA Starê wergirt. Hostatiya li ser taktîkê, wêrekiya mezin, dilsoziya bi nirxên pîroz re û baweriya bi serketinê ya YJA Starê, di şexsê hevrêyên me yên li Zapê de careke din şênber bûn. Fermandar û milîtanên bijarte yên YJA Starê hevrêyên me Viyan û Eylem ku xwedî sekna lehengiyê bûn, pêşengî ji tîmên gerîla yê bi tevger re dikirin, derbên giran li dijmin dixistin û rê nedan dijmin, şehîd ketin. Sekn, têkoşîn, şerkerî, wêrekî û fedaîtiya herdu hevrêyên me wê timî rê nîşanî me hevrêyên xwe bide û bibe hinceta me ya ji bo tolhildan û serketinê. Agahiyên li ser nasnameyên hevriyên me yên şehîd bûne wiha ne:

Nasnav: Viyan Botan
Nav paşnav: Sevîm Dayar
Cihê jidayikbûnê: Şirnex
Dayik-Bav: Kanîa-Mûstafa
Dem û cihê şehadetê: Nîsana 2022 / Zap

Nasnav: Eylem Ronî
Nav paşnav: Dilvîn Ato
Cihê jidayikbûnê: Kobanê
Dayik-Bav: Necla-Îbrahîm
Dem û cihê şehadetê: Nîsana 2022 / Zap
***ANF***

# QSD’ê idîayên Wezareta Parastinê ya dewleta Tirkan derew derxistin

**QSD’ê ragihand ku nûçeyên ji aliyê Wezareta Parastinê ya dewleta Tirkan ve derketine ku êrişa li ser Karkamişê dispêrin hêzên wan derew in û got, artêşa Tirkan van derewên xwe dikin bingeh û êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike.**

Navenda Ragihandina QSD’ê bi daxuyaniyekê bersiva nûçeyên Wezareta Parastinê ya dewleta Tirk dan ku êrişa li ser Karkamîşê spartine QSD’ê.
QSD’ê got: “Ev bûyer provakasyonek e û bi vê provakasyonê ve hedef dikin ku êrişên xwe li hember axa Bakûr û Rojhilatê Sûriye dijwartir bikin.”
Daxuyanî wiha ye:

Li gorî nûçeyên ku îro ji aliyê Wezareta Berevaniyê ya dewleta Tirk a dagirker hatine belavkirin, ji aliyê hêzên me ve li hember navçeya Karkamişê êrişên bi hawan hatiye lidar xistin. Êrişa ku li hember Karkamişê hatiye kirin, ti têkiliyên me pêre nîn e. Artêşa Tirk a dagirker van derewê xwe dikin bingeh û li hember axa Bakûr û Rojhilatê Sûriye êriş dike. Di êrişên dagirkeriyê de gundên Kobanê, Eyn Îsa, Minbic û Şehba bi awayek dijwar tên hedefgirtin û heta niha bêhtirî 29 gund hatine topbarankirin. Ev bûyera ku li Karkamişê çêbûye, ji bo ku ev êrişên xwe rewa bide nîşandan ji aliyê artêşa Tirk a dagirker ve hatiye organizekirin. Ev bûyer provakasyonek e û bi vê provakasyonê ve hedef dikin ku êrişên xwe li hember axa Bakûr û Rojhilatê Sûriye dijwartir bikin. Pêwîst e gelê me û raya giştî ya cîhanê baweriya xwe bi nûçeyên bi vê awayî ve neynin.”
***ANHA***






# Banga Hawarê gihaya me

**Kovara Psychology Kurdî ku herî dawî jimara xwe ya 14’an derxist, rewşa kovargeriya Kurdî nirxand û bal kişand ser kovarên tematîk yên ji bilî edebiyatê ku niha derdikevin**

Kovara Psychology Kurdî ku herî dawî hejmara xwe ya 14’an derxist, rewşa kovargeriya Kurdî nirxand û bal bire ser kovarên tematîk ên ji bilî edebiyatê ku niha derdikevin. Her wiha ji bo mîrasa kovara Hawarê jî got, heger îro em bi vê alfabeyê dinivisînin bi saya Hawarê ye.

Nirxandina Kovara Psychology Kurdî wiha ye; “Kovargeriya Kurdî di her dem û dewranan de bi pirsgirêkan re rû bi rû maye. Lê her dem jî li ber xwe daye û her dema ku firset hatiye dîtin jî kovergeriya me xwe gîhandiye weşanê. Gava em bala xwe didinê heta salên 2000’î çend kovar tenê derdikevin û carina yek tenê dikare li ser darê linga bimîne. Ango bi teqla be jî kovargeriya me li ber xwe daye. Lê divê em vê ji bîr nekin, heta van salên dawî jî di nav de, ev kovargeriya ku em behsa wê dikin hema bêjin hemû di çarçoveya edebiyatê de ye.

Lê îro roj gava em bala xwe didin kovarên ku derdikevin, em dibînin ku ji bilî kovarên edebiyatê yên tematîk jî derdikevin. Hin kovar tenê li ser qadekê kûr dibin û ev jî bi xwe re başbûnê tîne. Ji ber vê, mirov bi hêvî ye ku siberoja kovergeriya me wê baştir bibe û jixwe her diçe jî baştir dibe.
Hawarê kir ku em bi kêmasiyên xwe bihisin û di vî warî de gelek mînakên pêşî ku berî wê ti kesî û ti kovaran nedabûn, da ber xwe.

Ji ber vê, Hawarê mîraseke ku divê em xwe di gelek rêyan de biceribînin ava kir. Ew kêmasî şanî me kirin. Eger firset hebûya û Hawar hinekî din li ser linga bimaya, belkî îro kovargeriya me hîn li pêştir bûya. Belkî em dereng bi Hawarê hisiyabin lê îro roj kêmasî hebin jî em di wê baweriyê de ne ku banga Hawarê gihaye me. Eger em niha vê nivîsê jî bi vê alfabeyê bikaribin binivîsîn, ev xwedîderketina li wê mîrasê ye.”
***Ozgûr Polîtîka***




# Deng û awaza şoreşa Kurdistanê

**Şehîd Hozan Mizgîn (Gurbet Aydin) yek ji hunermendên Kurd yên şoreşger e û hunerê şoreşgerî û neteweyî pêş xistiye.**

Şehîd Hozan Mizgîn (Gurbet Aydin) yek ji hunermendên Kurd yên şoreşger e û hunerê şoreşgerî û neteweyî bi pêş xistiye. Herwiha bi riya huner civak jî bi rêxistin kiriye. Hozan Mizgîn sala 1962’yan li gundê Bileyder a Êlihê tê dinyayê. Beriya darbeya leşkerî ya Tirk a 1980’yî, tevlî nav refên têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê dibe.
Li Êliha wê demê ku tevger û sendîkayên bihêz ên karkeran xebat dimeşand, PKK’ê nas dike. Wê demê yek ji damezrînerê PKK’ê



Mazlûm Dogan li Êlihê xebatên propagandayê dimeşîne û mal bi mal digere ji bo nasandina PKK’ê. Hozan Mizgîn jî di vê demê de li gel komek ciwanên Êlihê tevlî nav refên PKK’ê dibe. Bi vî awayî dibe jina yekem a ji herêma Êlihê tevlî nava refên PKK’ê bûye.
Mizgîn ji bo perwerdeya îdeolojîk a Tevgera Apoyî, berê xwe dide kampa perwerdê ya Bekaayê. Piştî temamkirina perwerdeya îdeolojîk a PKK’ê, ew ji bo rêxistinkirina xebatên çand û hunerê Kurdî li Ewrûpayê tê wezîfedarkirin. Hozan Mizgîn li gel Hozan Sefkan ji Bekaayê diçe Ewrûpayê. Li gel Hozan Sefkan bingehê ‘Huner-Kom’ û ‘Koma Berxwedan’ê datînin.

### Kasetên qedexekirî

Hozan Mizgîn piştî li Ewrupa dest bi xebatên hunerî û çandî kir, di demeke kurt de gelek stranan çêdike. Hin ji stranên wê yên navdar wiha ne; ‘Hebûn’ ‘Çemê Hêzil’, ‘Lo Hevalo’ û ‘Gundîno Hawar’.
Ev berhemên hunerî yên Hozan Mizgîn û avakirina komên stranan bûn yek ji materyalên bihêz ên propagandaya şoreşê. Stranên wê, li Bakurê Kurdistanê qedexe bûn, lê dîsa jî xelkê li kasetên qedexekirî yên Hozan Mizgînê, bi dizî guhdarî dikir.

### Yekem fermandara jin e

Hozan Mizgîn piştî xebatên xwe yên serketî yên di warê çand û hunerî de berê xwe dide çiyayên Kurdistanê. Hozan Mizgîn destpêkê fermandara eyaletê ye li Mêrdînê, paşê li ser pêwîstiyan diçe herêma Xerzan. Hozan Mizgîn, li Xerzanê jî yekem jina fermandar a eyaletê ye. Li gel birêvebirina şerê çekdarî, xebateke berfireh a propagandaya çekdarî jî li Xerzanê bi pêş dixe.

### Teslîmiyetê qebûl nake

Ji bo bikare xwe bigihîne jinên Xerzanê, gelek caran mîna wan çarşefê li xwe dike û xebatên rêxistinkirinê dimeşîne. Hozan Mizgîn li herêmê deng vedide û dibe armanca êrişên dewleta Tirk û nokerên wê. Di 11’ê Gulana 1992’yan de dema ji bo wezîfeyekê dixwaze ji Xerzanê biçe Tetwanê, li ser giliyê sîxûran, dewleta Tirk dor li mala ew lê digire. Hozan Mizgîn ji bo ku dijmin wê negire, ji ber ku teslîmbûnê qebûl nake, bi dermancê xwe şehîd dike.
***Ozgûr Polîtîka***

# “Zimanê Kurdî” bi zarokan xweş e

**Di çarçoveya 15’ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de li navçeya Bismilê ya Amedê ji bo zarokan bernameyeke ziman û çandê hat lidarxistin.**

Di çarçoveya 15’ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî de li navçeya Amedê Bismilê, ji bo zarokan bernameyeke ziman û çandê hat lidarxistin.
Çalakiyên bi pêşengiya Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî, ji bo 15’ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî tên lidarxistin, dewam dikin. Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Mezopotamyayê (MED-DER), Komeleya Çand û Huner a Dîcleyê, MA Muzîkê li taxa Seyrantepe ya Bismilê bername li dar xist.
Destpêkê bi erbaneyan meş hat lidarxistin û piştre jî alfebaya Kurdî fêrî zarokên taxê kirin. Dûre jî serûçavê zarokan hat boyaxkirin û resm hatin xêzkirin. Zarokan, li ser cawekî spî tiştên ku xeyal dikin, xêz kirin.
Her wiha ritma muzîkê jî fêrî zarokan hat kirin û zarokan bi hev re strana Aram Tîgran a



“Zimanê Kurdî” got. Bername bi gerandina govendê bi dawî bû.
***MA/AMED***

# ‘Sekna Mizgîn perspektîfa me ye’

**Navenda nûçeyan**

**Komîteya Çand û Hunerê ya PKK’ê, şehîd Hozan Mizgîn (Gûrbet Aydin) di salvegera 30’î ya şehadeta wê de bi bîr anî.**

Komîteyê got, “Yek ji şehîdên leheng ên Gulanê şehîd Mîzgîn e. Hunermenda şoreşger û fermandara efsanewî Gûrbet Aydin, bi navê din Mizgîn, di 11’ê Gulana 1992’yan de li Tetwanê, bi berxwedaneke bi heybet tevlî karwanê nemiran bû. Şehîd Mizgîn li pey xwe modêleke kesayeta jin a azad, hunermend û şoreşger ji bo me hişt. Em di şexsê şehîda nemir heval Mizgîn de tevahî şehîdên xwe bi bîr tînin, soza pêkanîna xeyalên wan dubare dikin.

Îro modernîteya kapîtalîst ji bo nirxên civakê bênirx bike û



civakê ji hev belav bike, huner û hunermend weke amureke sereke bi kar tîne. Li şûna feraseta kom, komînalbûn û civakbûnê, takekesiyeke ji disîplîn, felsefeya azadiyê û jiyana watedar qutbûyî, dide pêş. Şehîd Mizgîn di meşa xwe ya pêşengiya jin a milîtanî û pêşengtiya hunermenda civakî û şoreşgerî de li dijî vê feraseta dijcivakî, dijçandî û dijwateyî xeteke azad diyarî me kir.

Em weke gel û tevgera azadiyê îro di hemleya ‘Dem Dema Azadiyê ye’ de ji bo Rêberê we, ji bo welatê xwe têdikoşin. Gerîlayên qehreman li hember dagirkeriyê bi ruhekî fedaî şer dikin û pergala dijmin parçe dikin. Her hunermend jî pêwist e bi vî ruhê şoreşger tevbigere û têkoşînê mezin bike.
Heval Mizgîn bi sekin û jiyana xwe, bi têkoşîn û şoreşgeriya xwe bû sembola şehîdên tevgera çand û huner a azad. Dîsa 11’ê Gulanê ku salvegera şehadeta şehîd Mizgîn e, weke roja şehîdên tevgera çand û huner hatiye pejirandin û îlankirin.

Em, weke şagirt û hevrêyên şehîd Mizgîn, careke din wê bi bîr tînin û soz didin ku sekna wê ya hunermend, fermandar û jina azad wê bibe perspektîfa me.”

# Li herêma Cizîrê çandinî di çi rewşê de ye?

## Ji ber kêmbarîna baranê, îsal zeviyên bejî pir xerab in. Lê zeviyên avî rewşa wan baş e û ji bo hatineke baş, alîkariya cotkaran didome.

Serbest Etê/Qamişlo

**Baran herî pir li Hîmo û herî kêm li Mergeda bariya**

Li gorî amarên fermî yên sazyiyên çandiniyê yên Hikumeta Şamê, li Dêrikê 199.1 ml, Çil Axa 184.6 ml, Hîmo 278 ml, Qamişlo 217.7 ml, li Dirbêsiyê 186 ml, Til Birak 232.5 ml, Hesekê 142 ml, Holê 108 ml, Tiltemir 123 ml, Şedadî 85 ml û Mergeda 63 ml baran bariya. Halbiku li gorî pisporên çandiniyê, rêjeya baranê ya guncaw û pêwîst ji zaviyên çandiniyê re 400-450 ml e.

**Rewşa zeviyên bejî çi ye?**

Li ser rewşa dawî ya çandiniyê li herêma Cizîrê, Hevserokê Desteya Çandinî û Avdanê ya kantona Qamişlo Nayif Îbrahîm ji me re axivî û diyar kir ku ji ber rewşa avhewaya hişk û ziwha ya îsal ku bû sedema kêmbarîna baranê, rewşa zeviyên bejî (hem yên genim hem yên ce) pir xerab e.

**Zeviyên avî û bandora barana dawî...**

Nayif Îbrahîm herwisa bal kişand ser barana dawî ya barî û wiha şîrove kir: "Tevî ku di vê dema dawî de baran barî, lê ji ber ku pir derneg bû, zeviyên bejî ti sûd jê negirtin. Ji ber wê, wê hatin û berhemên zeviyên bejî yê vê sale pir kêm bin. Lê ev baran ji bo zeviyên avî, bempû û sebzeyan pir baş bû."

**Alîkariyên Rêvberiyêa Xweser bi cotkaran re**

Nayif teqez kir ku Rewşa zeviyên avî baş e û got, lewra hem barana dawî ya barî ji bo wan baş bû, hem desteya Çandiniyê bi diyaloga bi Komîteya Sotemeniyê re, alîkariya cotkaran ji aliyê mazotê ve didomîne. Herwisa wek alîkarî desteyê bendavên avê ji zeviyan re vekirin û zeviyên avî tên avdan li gorî derfetên heyî.
Hevserokê desteya çandinî û avdanê ya kantona Qamişlo diyar kir ku alîkariya wan ji cotkaran re li gorî derfetan didome û ev agahî dan: "Alîkariya desteyê bi cotkaran re di çarçoveya belavkirina mazotê de tenê sînordar namîne, ji aliyekî din ve xebat û alîkarî ji aliyê desteyê ve ji cotkrarann re tê dayîn. Ji aliyê di ve nexweşî li nava zeviyan pir kêm bû. Lewra hem baran kêm bû û hem ji aliyê komîteyan ve derman tê reşandin û pêşinyar ji cotkar re tên dayîn."

**`Her dawî 16 milyon mazot li ser cotkaran hat belav kirin`**

Li gorî Desteya Çandinî û Avdanê ya Herêmê Cizîrê, rûbera çandina avî bi giştî li herêmê 2 milyon û 353 hezar û 777 donim e; rûbera genimû avî jê 1 melyon û 307 hezar û 429 donim e.



Hêjayî gotinê ye ku alîkariya cotkaran ji her alî ve ji aliyê Desteya Çandiniyê ve didome, nexasim belavkirina mazotê ku li herêma cizîrê li ser çar pêlan hat belavkirin. Miqdara pêla çaran 16 milyon bû, li gorî agahiyên Desteya Çandinî û Avdanê ya herêma Cizîrê, eger pêwîst bê dîtin wê pêleke din ya mazotê li cotkaran belav bikin.

**Ji bo avadana 210 hezar û 500 donimî 5 bendav hatin vekirin**

Di encama xebat û alîkariya cotkaran û zeviyên avî de, li herêma cizîrê 14`ê Nîsanê bendavê Bab EL-Hedîd û Çil Axa ku hêza wê avdana 4000 donimî heye hat vekirin. Herwisa li navçeya Dêrikê 19`ê Nîsanê bendava EL-Hakimiyê ku karîna 2500 donimî av bide û li Tirbespiyê bendava Mizgeftê ku karî 4000 donmiî av bide, hatin vekirin. Li kantona Hesekê jî 8`ê Gulanê bendava Xabûrê Başûr ku karî 200 hezar donimî av bide hat vekirin.

**`Ji bo parastina zeviyan ji şewatê komîte ava bûne`**

Hevserokê desteya çandinî û avdanê ya Kantona Qamişlo Nayif Îbrahîm li ser tedbîrên çandinyê av agahî dan û axaftina xwe qedand: "Bi riya Desteya Çandinî û Avdanê ji bo parstina zeviyan perspektîf ji



sazyî û aliyên pêwendîdar re tên dayîn. Li ser vî bingehî 7`ê Gulanê bi amadekariya Nûneryên Desteya Çandiniyê, Kongereya Starê, Asayîş, Hêzên parastina civakê û Yekîtiya cotkar û kesdkaran û Şaredariyan herêmê civîn hat lidarxistin û Komîteyeke ji bo rewşên awarte hat pêkanîn. Komîte wê erkê wê şopandin û çavdêriya zeviyan li herêmê be. Herwisa pîvan û ferman hatin dayîn ji bo xwediyên deraseyan ku nabe bê agirkuj û depoyên avê kar bikin. Şaneyên ewarte û agirkujên şaredariyan wê di vê demê de di amedabaşiyên de bin. Wê ev komîte bi aliyên û saziyên têkildar re di vê demê de li ser rêgirtin li derketina şewatan bixebitin."
Hêjayî gotinê ye ku Desteya Çandinî û Avdanê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ragihand ku wê 25 Gulanê deriyê xwe ji bo girtina berhemên çandiniyê ji cotkraran re vekin û navendên wan li sernaserê bakur û rojhilatê sûriyê di tevgerê de bin.

# Hişkesalî ji sedan 29 zêde bûye

**Li gorî rapora ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hatî weşandin, di cîhanê serdemên ziwabûnê li gorî sala 2000'î ji sedî 29 zêde bûne.**

Konferansa Xaka Cîhanî ya li peravên Fîldîşiyê hatî lidarxistin, rapora hişkesaliya gerdûnî weşand.

Li gorî raporê ji sala 2000'an û pê ve pêvajoyên hişkesaliyê yên li cîhanê hem zêde bûne û hem jî dirêj bûne. Maliyeta aborî ya ji ber sedema hişkesaliyê jî hatî jiyan kirin, weke 124 milyar dolar hat hesap kirin.
Rêvebirê giştî yê Hevpeymana Têkoşîna bi çolbûna NY'ê re Îbrahîm Thîaw diyar kir ku welat bi hişkesaliyê re rû bi rû dimînin, xakên bi berhem divegerin tozê û got ku hişkesalî (Xela) li pêşiya pêşketin û geşedanên mayînde gefa herî mezin e.

Pirsgirêka zêdebûna avê, tûnebûna xakên bi berhem û hişkesaliyên dewam dikin heya niha herî zêde li welatên kêm pêşketî yên herêma Sahel a Efrîqa di rêjeyek mezin de



bandor kir, lê welatên li herêmên cûda jî her kû diçe nerênî bandor dibe.
Tenê ev sal li gorî daneyên NY'e 160 mîlyon zarok bi berdewamî bi encamên hişkesaliyê re, rû bi rû mane. Di tevahiya cîhanê de jî pêwîstiya avê ya 300 mîlyon mirovan bi têra xwe ne hat tedarîk kirin. Li gorî daneyên NY'yê diyar dibe ku wê heya sala 2040'an di tevahiya cîhanê de ji çaran yekê zorok, pirsgirikên avê jiyan bikin.
Li gorî raporê wê disala 2050'an de di navbera 4 mîlyar û 800 mîlyon û 5 mîlyar û 700 mîlyon de mirov, herî kêm yek meh, wê li herêmên ku pirsgirka avê lê heyî jiyan bikin. Di pêvajoya niha de jî ev hêjmar weke 3 mîlyar û 600 mîlyon tê diyar kirin.
*ANF*

# Pêngava paqijkirina rêya Dêrik-Qamişlo hat destpêkirin

**Şaredariya bajarê Dêrikê bi hevkariya bajarokê Xana Serê ji bo paqijkirina rêya giştî ya di navbera Qamişlo û Dêrikê de, pêngaveke paqijiyê da destpêkirin.**

Beşê Jîngehê yê Şaredariya Gel a Dêrikê ji bo paqijkirina her du aliyên rêya giştî ya di navbera Qamişlo û Dêrikê de, hemleya paqijiyê da destpêkirin.

Xebatkar û endamên Beşê Jîngehê yê Şaredariya Gel ji saetên sibehê ve dest bi hemleyê kir. Her wiha belavokên li ser girîngiya paqijiyê li ajokaran belav kirin.
Rêvebereke Beşê Jîngehê yê Şaredariya Gel a navçeya Dêrikê Heyfa Hesen têkildarî armanca hemleyê ji ajansa me re axivî û got: "Arman-



ca hemleya paqijkirina rêya giştî hişyarkirin û belavkirina çanda paqijiyê di nava gel û ajokaran de ye, da ku di dema çûn û hatinê de gemarê navêjin."

Heyfa Hesen diyar kir ku ji ber gemarê bêhneke nexweş derdikeve, bi taybet di havînê de û dibe sedema nexweşiyên vegir. Heyfa Hesen bang li welatiyan kir ku li paqijiya bajêr baldar bin.

Heyfa Hesen her wiha bang li



gel û bi taybet li ajokaran kir ku dûvikên cixaran navêjin ser rêyan û got: "Demsala çinînê nêz bûye, divê dûvikên cixaran navêjin ser rêyan da ku berhemên xelkê neşewitin."
Tê payîn ku hemû şaredariyên kantona Qamişlo beşdarî vê hemleyê bibin da her du aliyên rêya giştî ji deriyê ketina navçeya Dêrikê heta bajarê Qamişlo û navenda bajar û navçeyan werin paqijkirin.
*ANHA*



# Piştî rizgarkirina Tebqa, rewşa jinan ji koletiyê veguherî pêşengiyê

## Piştî bajarê Tebqa ji çeteyên DAIŞ`ê hat rizgarkirin rewşa jinên wê hat guhertin. Cilên reş ji ser xwe avêtin û parastina bakur û rojhilatê Sûriyê kirin.

Piştî "Bihara Ereban" di destpêka 2011'an de, DAIŞ li Sûriyê peyda bû. Bi wê re rewşa jinan hate guhartin. Li herêmên çeteyên DAIŞ'ê dagir kirine, jin weke kole dihat bikaranîn. Biryarên tund li dijî wê dihatin dayîn. Ji mafê xwe yê fêrbûn û karkirinê, derketina bi tenê ji malê bê par ma û di sûkan de weke sebî dihatin firotin. Çeteyên DAIŞ`ê piştî ku bajarê Tebqa di 2014`an de dagir kir, rola jinê paşguh kir, biryarên negirêdayî di tu destûr an jî şerîtê de tune ne li ser wan ferz dikirin û sûcên hovane li dijî wan pêk dianî.
Piştî nêzî 50 rojî ji hemleya ku ji aliyê QSD`ê ve di 21`ê Adara 2017`an de, 10`ê Gulana 2017`an rizgarkirina bajarê Tebqayê hate ragihandin.

Hemleya rizgarkirinê bi pêşengtiya YPJ`ê bû ku di 4`ê Nîsana 2013`an de damezirandina wê hate ragihandin. Îro di salvegera 5`emîn a rizgarkirina bajar de, endama Fermandariya Meclisa Leşkerî ya Tebqa û şervana YPJ`ê Emîra Mihemed hin zehmetiyên di dema çeteyan bajar dagir kiribûn de bi bîr xistin û wiha got: "Li gorî qanûnên ku qaşo şerîî ne hesab ji jinan dihat dixwestin. Lê heger mirov baş balê bide sûcên ku çeteyan dikir, wê bibînin ku komkujî li dijî gelan pêk dihat û di serî de jin. Ev yek jî bi îdiaya ola Îslamî dihat kirin."
Emîra Mihemed beriya ku Tebqa ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve were dagirkirin mamoste bû û ji ber ev yek ji wan re hate qedexekirin dev ji karê xwe berda. Emîra Mihemed wiha domand: "Min şerê komek ji El-Hisube dikir. Ne tenê wisa lê belê fêrbûn bi hinceta ku ne li gorî hebûna jinê di civaka parastî de ye, hate betalkirin."

Endama nivîsgeha Şopandinê ya Meclisa Leşkerî ya Tebqa Betûl Ehmed jî wiha axivî: "Pir kêm, me jin di kolanên bajar de didîtin. Dema ku me Cilên reş ku tevahî rû yan jî nîvê wî digire li xwe dikir, em ji xwe ditirsiyan. Tu rola me di civakê de tune bû."



Betûl Ehmed bi van gotinan axaftina xwe domand: "Jin bûbû kole. Mîna madeyekê ku bazirganî li ser dihat kirin. Ji ber wê jî ez û zarokên xwe piştî du salan ji dagirkirina bajar ji hêla DAIŞ`ê ve ji bajar reviyan. Rojeke pir tarî bû. Ez û zarokên xwe derketin (3 keç û kurek) reviyan bajarê Hesekê. Me bi meşê dirêjahiya di navbera her du bajaran de derbas kir da ku em bi ewle li herêmên Rêveberiya Xweser bijîn."

**`MERTALÊN ZINDÎ`**

Endama Fermandariya Meclisa Leşkerî ya Tebqa û şervana YPJ`ê Emîra Mihemed diyar kir ku dema ku QSD`ê bajar rizgar kir, ew di nîva bajar de bûn û li benda hatina YPJ – YPG`ê û QSD`ê bûn û wiha pê de çû: "Em ber bi gundewaran ve çûn ku QSD`ê li wir bûn. Lê çeteyên DAIŞ`ê em xistin çemberê, da ku me weke mertalên zindî bikar bînin, dema ku zext li wan dihat kirin. Em li bendên bûn, em ji wan kesên hov ên ku jin bi tawanên nerewa dixistin girtîgehan, bihatana rizgarkirin. Piştî xistina girtîgehê 15 roj jin dixistin "perwerdeya şerîî" bi hinceta jin li rêya rast vegerin."
Emîra Mihemed di berdewama axaftina xwe de ev tişt got: "Bi nêzîkbûna QSD`ê re, 8 mehan li herêma Kehreba ya nêzî bajarê Reqayê em hatin dorpêçkirin. Ji ber êrişan em ji malekê diçûn malekê. Paşê em



çûn herêma El-Kesrat a gundewarên başûrê Reqayê heta ku ji aliyê QSD`ê ve hatin rizgarkirin."

Bi rizgarkirina Tebqa ji çeteyên DAIŞ`ê, serdemeke nû ya jinê dest pê kir. Jinan cilên reş ku di dema dagirkirina çeteyên DAIŞ`ê de li xwe dikirin, avêtin. Li şûna wan, cilên leşkerî li xwe kirin û parastina bajarê xwe ji xeteriyên derve kirin. Ev jî guhertineke berçav ji rewşa wê re ye.

Emîra Mihemed destnîşan kir ku her kesên ku beriya hatina QSD`ê herêm xistibûn bin serweriya xwe biryarên li gorî çavnebariya xwe ferz dikirin û wiha anî ziman: "Em li hêviya hatina QSD`ê bûn ku me ji van qanûnan rizgar bike."

**`DEWLETA TIRK SÛCÊN DAIŞ`Ê DIDOMÎNE`**

Piştî têkbirina DAIŞ`ê ku dewleta Tirk a dagirker destek dida û hîna jî dide wê, dewleta Tirk hewl da bi hemû rêbazan vîna gelê serbixwe têk bibe, lê ya herî zêde hiştiye bi-



keve nava tirs û fikaran ew e ku jin pêşengtiyê dike û civaka Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rê ve dibe. Ji ber wê bi rêya balafirên bêmirov dest bi hedefgirtina vîna wan kir. Herî dawî jî balafireke bêmirov a dewleta Tirk a dagirker erebeya 3 endamên YPJ'ê hedef girt û di encamê de Hevseroka Desteya Parastinê ya Kobanê Ronahî Kobanê, endamên YPJ'ê Dilar Heleb û Kobanê di 20'ê Nîsanê de şehîd bûn.

Emîra Mihemed têkildarî êrişên ku dewleta Tirk li dijî jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne ev tişt anî ziman: "Îro dewleta Tirk sûcên ku çeteyên DAIŞ`ê dikir, didomîne. Jinan dike hedef nexasim jinên rêveber. Ji ber ji her demê zêdetir ji jinan ditirse ku jinan di eniyên şer û hemû aliyan de, xwe îsbat kir."
Endama Fermandariya Meclisa Leşkerî ya Tebqayê Emîra Mihemed di dawiyê de teqez kir ku YPJ`ê amade ye ku li hember çi êrişên ku dewleta Tirk li dijî wan pêk bîne, bisekine.
*ANHA*

# Wesiyeta şehîd Ronahî Kobanê ji jinan re çi bû?

**Şehîd Ronahî Kobanê, xwediya têkoşîna her kesê pê re maye şahid e. Ronahî Kobanê pêşengên jin yên şoreşa Rojava weseyet kir ku têkoşînê xurt bikin da şoreş bi ser keve, ango şoreşa jinan bi ser keve.**


FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Şehîd Ronahî, weke navê xwe ye, rêya gelê xwe ronî dike, tevî ku ew rê tijî zehmetî ye, lê wê qet guh neda zehmetiyan, bi vîna xwe hemû astengî derbas kir, bi şehadeta xwe destaneke nû ji destanên şervanên jin ên Kurd nivîsand.
Şehîd Ronahî Kobanê anku "Rodîn Apo" di sala 1996'an de li gundê Mînas ê li rojavayê bajarê Kobanê ji dayik bû. Malbata wê ji 7 kesan; 4 xort û 3 keçan pêk tê.
Şehîd Ronahî li Kobanê bawernameya amadehî bi dest xist, piştre berê xwe da Helebê û dest bi xwendina hiqûqê kir. Weke bi hezaran ciwan û keçan, ew jî tevlî nava şoreşa 19'ê Tîrmehê bû.
Birayê wê Xalid Apo wiha dibêje: "Zilma ku li ser gelê me dihat meşandin, hişt ku xwişka min dest ji xwendinê berde û tev li şoreşê bibe. Her tim digot; ez ê heta dilopa dawî ya xwîna xwe têkoşîn bikim. Bi rastî heta gihişt asta şehadetê têkoşîn kir."
Şehîd Ronahî destpêkê xebata hemşîretî û dermankirina birîndarên şer ên berxwedan Kobanê li dijî DAIŞ'ê dikir.
2014'an dema ku bajarê Kobanê ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hat dorpêçkirin şehîd Ronahî cara yekê tev li nava şer bû. Wê demê gel hatibû koçberkirin, tenê YPG/YPJ mabûn û şer dikirin.

**ŞEHÎD RONAHÎ NAYÊ WESIFKIRIN**

Şehîd Ronahî gelek caran birîndar bû, lê di berxwedana Kobanê de di serê xwe de birîndar bû. Piştî baş bû, careke din vegeriya çeperên şer û li dijî çeteyên DAIŞ'ê şer kir.
Li ser vê yekê Xalid Apo wiha domand: "Xwişka min xwedî vîna xurt bû, ew di her tiştî de cuda bû, nayê wesifkirin. Ji bo têkoşîna xwe dewam bike, birîna wê nehat bîra wê."
Piştî çend salan ji têkoşînê û ji ber xebata wê di refên YPJ'ê de, dest bi karê hevserokatiya desteya Parastinê ya herêma Firatê kir. 20 Nîsana borî di encama êrişa balafireke bêmirov a biçek a dagirkeriya Tirk de, li gel her du hevrêyên xwe Ranya Henan (Dilar Heleb) û Cîhan Nîdal Elî şehîd bûn.
Beriya wê jî di 23'yê Hizîrana 2020'an de dema ku balafireke bêmirov a biçek li gundê Helincê malek kir hedef, her du endamên Koordînasyona Kongra Star li herêma Firatê Zehra Berkel û Hebûn Mele Xelîl û xwediya malê dayika Emîne Weysî şehîd bûbûn.
Di 12'yê Cotmeha 2019'an de di dema êrişa artêşa Tirk a dagirker li ser bajarên Serêkaniyê û Girê Spî de li ser rêya M4 Sekretera Partiya Sûriya Pêşerojê Hevrîn Xelef û ajokerê wê Ferhad Remedan bi destê çeteyên artêşa Tirk a dagirker şehîd bûbûn.
Hevseroka Nivîsgeha Erka Xweparastinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Beyan El-Elî, li Akademiya şehîd Jînda ya YPJ'ê şehîd Ronahî nas kir ji ajansa me re axivî.
Beyan El-Elî got: "Çiqas em behsa şehîdên weke Ronahî bikin em ê der heqê wan de kêm wesif bikin. Şerê ku li dijî DAIŞ'ê kirin, cîhanê nikarîbû bikira, wan şerekî destanî da meşandin, bi pêşengtiya jinên Kurd çete hatin têkbirin."
Beyan El-Elî ev tişt got: "Rojekê jî bi birînên xwe hest nedikir, ji ber fedekariya wê ji bo dozê û nêzîkbûna wê







bi şêniyan re, ew weke hevseroka nivîsgeha erka xweparastinê ya herêma Firatê hat erkdarkirin. Ji ber em bawer bûn ku ew ê xizmeta bajarê xwe bike."

**`HÛN PÊŞENGÊN ŞOREŞÊ NE... JI BO KU ŞOREŞ BI SER KEVE TÊKOŞÎNA XWE BILIND BIKIN`**

Endama rêveber a Nivîsgeha Erka Xweparastinê ya herêma Firatê Suheyle Kerho ev tişt got:" Heval li dora wê kom dibûn, ji wê hêz digirtin, bandoreke mezin li jiyana me kir, ew bi me re pir dilnizm bû."



Suheyle Kerho hin gotinên şehîd Ronahî vegotin û wiha ne: "Hûn pêşengên şoreşê ne, , ji bo serxistina şoreşê serkeftî bin. Tevî ku kêmî salekê bi me re kar kir, lê me hest dikir ku em bi salan wê nas dikin, ew pir nêzîkî me bû."
Endama rêveber a Dîwana Erka Xweparastinê ya herêma Firatê Necah Bozan jî got: "Şehîd Ronahî di karê xwe de çalak bû, me ji wê hêz digirit, ji me re digot xwe li paş zilaman veneşêrin, bibin pêşengên civaka xwe, wê dihişt ku em ji dil kar bikin."
*ANHA*

# 383 sal ji parçekirina Kurdistanê…avakirina dîwaran têkçûyîna dagîrkeran nîşan dide

## Dewletên dagîrker ji Qesra Şîrîn heta avakirina dîwaran, israra wan di konsepta qirkirina gelê Kurd de eşkere dike, herwisa têkçûyîna wan li hemberî têkoşîna gelê Kurd nîşan dide.

**Serbest Etê/Qamişlo**

Kurdistan wek têgeh sedsala 12. ji aliyê Selçûqiyan ve cara yekê ji welatê Kurdan re tê bikaranîn. Wateya wê jî Welatê Kurdan e. Koka têgeha Kurd ji peyva `kur` ya sumerî ya ku wateya wê çiya ye, tê li gorî dîrokzanan. Lê di dîrokê de welatê Kurdan ango Kurdistan bi gelek navan hatiye pênasekirin. Lewra ji heman erdnîgaryê ve Sumer û Aşûran digot Kurtî û Babilan digot Kardû. Dema Grek û Roma jî Kurdistan bi Kardukiyan dihat pênasekirin ev jî li gorî dîrokzan Heredot (B.B 450) û dîrokzan Ksenophon (B.B 430) tê teqezkirin. Herwisa ji milê Ereban ve Bîlad Ekrad tê bikaranîn.

**`Şerê desthilatdaran li ser xaka Kurdistanê`**

Têkildarî peymanên dagîrkeran û pêvajoya niha li Kurdistanê diqewime, Hevserokê Kongereya Gel Remzî Kartal ji me re axivî.
Remzî Kartal diyar kir ku dewleta Osmanî û Sefewiyan şerê desthilatê li ser xaka Kurdistanê dijwar kirin. herwihan bîranî ku bi taybetî di serdema sultanê Osmanî Yawuz Selîm de û şerê çaldiranê parçekirina gelê Kurd û Kurdistanê dest pê kirin.

**Peymana Qesra Şîrîn…**

Di dîrokê de, peyamên di navbera dagîrkerên Kurdistanê de bi tiliyên desta neyên jimartin. Lê peymana yekê ku dagîkeran li hev kir û Kurdistan ji xwe re parçe kirin Qesra Şîrîn e. Ev Peyman li Qesra Şîrîna ya niha nêzî Kirmana rojhilatê Kurdistanê ye, 17`yê Gulana 1639`an di navbera şahê Sefewiyan Tehmasib û Mûradê çaran sultanê dewleta Osmanî de imza bû. Di encamê de Kurdistan li ser van her du dewletan parçe bû. Li ser vê peymanê polîtîkayên xwe heta sedsala 20`an li dijî Kurdan domandin. Lê dîsa sînorên xwe li dijî Kurdan jinûve dîzayn kirin. Lewra piştî hewldanên dewleta Tirkî ya dagîrker bi riya leşkerî serhildana Agirî ya bi pêşengiya Îhsan Nûrî Paşa bişkîne û bi ser neket, peymanek 22`yê Gulana 1926`an bi Îranê re imza kir. Li gorî peymanê, Tirkiyê bajarokê Kotur yê bi ser Wanê ve bide Îranê, li beramberî wê jî Îrana çiyayê Agirî digire.

**Desthilatdaran li ser bingehê Qesra Şîrîn dest bi polîtikaya dagîrkirinê kir**

Hevserokê Kongereya Gel herwisa Teqez kir ku bi peyama Qesera Şîrîn ya di navber Osmanî û Sefewiyan de bi parçekirina Kurdisatê bandoreke xerab ji olî, civakî û bîrûbawerî li gelê Kurd kir û dagîrkeran li ser vî bingehî polîtîkayên xwe ava kirin.

**Lozan û çar parçkirina Kurdistanê**

24'ê Tîrmeha 1923`yan li bajarê Swîsre Lozanê di navbera Tirk, Îngîlîz, Fransî, Îtalî, Japonî, Yewnanî û Rusyan de li ser navê aştiyê piştî şerê cîhanê yê yekê peymana Lozanê tê imzekirin. Di encamê de Kurdistana parçekirî ya ser du dewletên dagîrker, li ser çaran tê parvekirin.

**Tevî parçekirina Kurdistanê, pêvajoya komkujî û bişaftina sîstematîk**

Derbarê Lozan û çar parçekirina



Kurdistanê de Remzî kartal herwiha ev nirxandin kir: "Lê belê parçekirina duduyan bi Sayke Peyko û Lozanê çêbû parçekirineke girin û li her milî jinêve bandor kir, ev parçebûna mezin bû. Ji lewra Modernîtena Kapîtalist xwest li tevyiya cîhanê pergaêla xwe ya hegemon li ser gelan bisipîne. Di vê çarçoveya, Welatan herêmên li ser bingeha dewlet netewe ava kirin. Ji aliyekî din dewleta neteweyên ku ji bo desthilatiya xwe xurtir bikin, peyam, kumkujî û guherina demogarîfîk û bişaftinê pêk anîn."
Hevserokê Kongereya Gel herwisa diyar kir ku tevî parçekirina Kurdistanê dewletên dagîrker di serî de dewleta tirkî li ser gelê Ermen, Laz û Suryan ji bo tinekirina wan polîtîkayên komkujiyê dijwartir kirin û axaftina xwe wiha domand: "Bi heman polîtîkayan xwest li ser gelê kurd jî bi vê polîtîkayên bighîje encamê tinekirinê. Ji ber wê gelê Kurd ber bi xetereke mezin ve çû, bi bişaftin çandê ket asta nemanê. Li Qesra Şîrîn armanca wan ferzikirin desthilatê bû. Lê bi lozanê dewletên dagîker pergala kapîtîasyt û xeteriya herî mezin pêvajoya kumkujiî û tinekirin dest pê kir, peyamn parçekirina duyamîn ya herî bi bandor bû û heta niha jî bandora wê heye."

**`Tevgera azadiyê ya Apoyî bûyîneke nû ya gelê Kurd e`**

Remzî Kartal herwisa li ser têkoşîna



PKK axivî û ev nirxandin kir: "Li ser vî bingehî Tevgera Azadiyê ya Apoyî dest pê kir sala 1973`yan. Rêbertiyê mudaxeleyî vê pêvajoyê kir, li hemberî vê pêvajoiyê serî rakir. Bi damezrandina PKK bûyîneke nû ji gelê Kurd li her çar dest pê kir. Yekîtiya neteweyî ji aliyê ol û bîrûbaweriyan û civakan ya gelê Kurd çêbû."

**`Avakirina dîwaran şkestin û bêçaretiya dagîkeran nîşan dide`**

Hevserokê Kongereya Gel diyar kir ku dewletên dagîker li hemberî berxwedana gelê Kurd bêçar man e û tavayiya hêza xwe xistine serferberiyê û axaftina xwe wiha qedan: "Li Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilat tevî êriş û polîtîkayên dagîkeran, encam negirtin. Ji ber wê di navbera Rojava û Bakur de, Bakur û Rojahilat, Rojava û Şingalê de dîwaran lêdike. Ev dîwar tên lêkirin di serî de dewleta tirkî ya dagîker û dewletên din diyar dike ku çiqasî tengav bûne. Neçarita wan nîşan dide, têkçûna siyaseta wan derdixe holê. Ev dîwar jî wê bêwate bibin weke ku peyama berê bêwate bûn. Lewra yekîtiya neteweyî pêş dikeve û temsîla wê têkoşîna gerîla ye. Ji ber wê divê gelê Kurd, rewşênbîr û hewlbstvan û her qadên civakê ji bo çar parçeyên û gelê kurdistanê têkoşîna xwe xurtir bikin."

# `Kesên li herêmên dagîrkirî tên bicihkirin tev Erdoganî ne`

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Ji bo kiryarên Tirkiyê yên nû û projaya avayiyên mêtîngeriyê li herêmên dagîrkirî endamê Kombenda Efrînê Ya Civakî Emîn Mihemed got, bicîkirina çeteyan û avakirina avayiyên mêtîngeriyê kiryarên dijmirovî ne.**

Di van çend salên dawî de, di encama êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker û çeteyên wê de li bakur û rojhilatê Sûriyê gelek dever hatin dagîrkirin. Dewleta tirkî şêniyên van herêman bi darê zorê dan koçberkirin û guhartineke demografîk çêkir. Niha jî li Efrînê avayiyên mêtîngeriyê tên çêkirin û malpatên çeteyan bi cî dikin.
Welatiyê ji Efrînê û endamê Kombenda Efrînê ya civakî, ya 24`ê Kanûna 2021ê hatî avakirin Emîn Mihemed, li ser kiryarên dagîrkeriya tirkî, guhertina demokrafiyê li herêmên dagîrkirî û avakirina avayiyên mêtingeriyê axivî.
Emîn Mihemed da zanîn ku dewleta tirkî bi hiceta koçberên Sûrî dixwaze DAIŞiyan û çeteyên xwe li herêmên dagîrkirî bi cih bike û axaftina xwe wiha domand: "Her kes dizane ku bicîkirina van kesan piresgirêkeke mezin e û kiryareke dijmirovî ye. Tirkiye bi riya vê projeyê dixwaze gelê herêmên li dijî hev derxe û şerekî navxweyî bide derxistin. Lê bila Erdoga baş zanibe em û birayên Ereb li dijî hev şer nakin. Kesên ku Tirkiyê wan li van herêman bi cih dike, ne welatiyên Sûrî ne, ne jî şêniyên Efrînê ne, kesin hov in weke Erdogan in. Milyon û nîv kesên ku li van herêman bi cih bûne tev Erdoganî ne."

**`Efrîn ya efrîniyan e, Tirkiyê çi bike jê re namîne`**

Emîn di dewama axaftina xwe de got, Tirkiye bi riya vê projeyê dixwaze Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî tevlî erdnîgariya xwe bike. Lê bila baş zanibe, ti caran malê xelkê nabe malê mirov. Efrîn ya Efrîniyan e, Serê Kaniyê û Girê Sipî jî yên xelkê wan in. Ew çi bike di dawiyê de jê re namîne, eger bi milyonan xaniyan çêke jê re namînin. Ev xaka me ye, çima Tirkiyê dest dide ser mal û milkên me û zarokê me dikuje. Tirkiye Kurdekî li kû dibîne êriş dike. Dewleta tirkî ne li dijî miroayiyê tenê, li dijî xwezayê ye jî. Her kesî dît dema Efrîn dagîr kir bi hezaran darên zeytûnan birîn.

**`Hevkarên Tirkiyê berjewendiyên xwe pê re didin meşandin`**

Emîn bal kişand ser kesên bi Tirkiyê re hevkariyê dikin û axaftina xwe wiha domand: "Gelek dewlet û hêz destê wan di vê projeyê de heye. Tirkiye li ber çavê her kesî guhertinê çêdike. Em bang li van hêzan dikin ku nebin weke dagîrkeriya tirkî, Tirkiye dewleteke xwînvexwar e. Heriwha em bang li rejima Sûrî jî dikin ku derfetê nede Tirkiyê. Mixabin Sûrî jî heta niha tiştek nekiriye. Tevayiya dewkletên ku hevkariya Tirkiyê dikin û bêdeng dimînin,



berjewendiyên xwe didin meşandin."

Emê vegerin, hêvî û baweriya me mezin e Endamê Kombenda Efrînê ya Civakî Emîn Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha got: Çima Erdogan van çeteyan li Stenbolê bi cih nake, çima wan li xaxa me bi cih dike. Çimkî dixwaze herêmên me xirab bike û çeteyan belav bike. Lê yê ku nede dû Ergogan, naçe li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî bi cih nabe. Heta niha em rojane dibêjin; emê vegerin, hêvî û baweriya me mezin e. Em xaka xwe ji dijmin re nahêlin. Eger rojek ji temenê me mabe emê li ber xwe bidin û vegerin cih û warê xwe.

**FENER**



## Mezinkirina berxwedanê şertekî hebûnê ye

**Idrîs HENAN**

Nêzîkatî, liv û tevgera dewleta Tirkan ya dagîrker, diyar dikin ku faşîzm li ber bicihanîna misyoneke nû a hêza hegemonîk a navendî ye. Rola ku NATO'yê daye ser milê Tirkiyê, bi xelatkirina êrişên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê re eşkeretir bû. Çawa ku hêza hegemon, ji bo berfirehkirin û domandina hebûna xwe faşîzma Tirk bi kar tîne, Tirkiyê jî wê hewcedariya wê û bicihanîna misoyneriyan ji bo pêkanîna projeyên xwe, bi kar tîne. Bê guman destkeftiyên Kurdan weke astengiya bingehîn li pêş xwe dibîne û êrişên ser wan weke mafekî xwe ya domandina dethilatdariyê dibînin.
Pêşengên hegemoniya navendî ya NATO'yê "DYE û Ingiltire" aliyê hişmendî û ideolojîk ve, êrişan rewa dikin û faşîzma Tirk teşwîqî berfirehkirina wan dikin û çavên xwe li hemleyên qirkirinê yên li dijî gelên Kurd û Ereb digirin. Ta ku proje jiyanî bibe, gelek aliyên ku teşwîqî hevkariyê kirin, tevlî vê projeya qirêj bûne. Di naveroka konsepta topyakûn de, parçekirin û tunekirina Kurdan û bê vînhiştina gelan heye. Bi gotinek din, hewl didin nakokiyên gelên herêmê kûrtir bikin û ji wê yekê sûdê werbigirin ku parçe bikin û bi yekê derbê lê bidin. Dixwazin pêkhateyên olî û etnîkî bînin rûbirûyî hev û îradeyên gelan ên di cebheya berxwedanê de hatine gel hev, ji nav bibin. Êrişên ku îro li ser Şehba û tevahî xeta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên kirin, bi wê mebestê ne.
Rewşa nû ya ku bi şerê Rûsya-Ukranyayê re derketiye, teşe û pozisyona hêzê jî bi xwe re aniya keviya guherînek bingehîn. Bê guman vê yekê bandor li ser rola Rûsya li herêmê kiriye ku li Rojhilata Navîn, li hemberî siyasetên Tirkiyê budilî bûye. Rûsya naxwaze carek din li herêmê ji dest bide. Herêmê jî weke hêmanek stratejîk di siyasetên xwe yên beramberî bloka NATO û YE digire dest. Ne dixwaze Tirkiyê, weke çavkaniyek hundirê NATO'ê ji dest bide, ne jî dixwaze baweriya gelan wenda bike.
Rejîma Sûriyê ku lihevkirinên xwe bi Tirkiyê re dinixumîne, li gorî nêzîkatiya ku raberî êrişên faşîzma Tirk dike, tê texmînkirin, eger hat û Tirkiyê êriş kir, wê ji xalên di nav qadên şer de vekişe û dê carek din gelên Sûriyê rûbirûyî qirkirina faşîzmê bihêle. Tabî, rejîma Sûriyê jî di nav vê konsepta berfireh de ye. ew jî li hemberî projeya gelan a çareseriyê, projeya Netewa Demokratîk, xwedî helwesteke qirker a bi dijminatiya faşîzma Tirkiyê re li hev kiriye.
Îran ku tê gotin di navbera wê û Rûsyayê de, li Sûriyê, hinek desguhertinên pozisyonan çêdibin, tevî ku parçeya "nerim" a vê konseptê ye, çawa li Îraqê mudexeleyê konsepeta rêgirtina li ber berfirehbûna hêza şî'a kir, gengaz e li Sûriyê jî hinek mudexeleyên bi vî rengî raber bike. Eşkere yan li paş perdê be, dê bi qasî berjewendiyên serweriya xwe li herêmê biparêze û dorpêça li ser xwe bişkîne, mudexele bike.
Ya girîng û esas ew e ku cebheya berevaniyê mezintir û berfirehtir bibe. Bi qasî ku eniya li hemberî faşîzma Tirkiyê û hevkarên wê bi hêz dibe, dê gelên herêmê ji felaketên misoger bêtin parastin. Berovajî wê, xwekujî û radestkirina vînê ye. Ji ber vê jî; piştgiriya berxwedana gerîlayên Kurdistanê û hemû şervanên azadiyê erekeî neteweyî û şertekî hebûnê ye ku hemû fikrên li ser tunekirina gelan têk bibin û jiyanek bi rûmet misoger bikin.



# `Ziman ew hêmena ku dihêle civak li ser lingan bimîne`

## Bi pêmana Roja Zimanê Kurdî mamosteya ziman Necbîr Elî got, pêwîst e zimanê kurdî ne zimanê perwerdeyê tenê be, yê bazarê, danûstandinê û yê civakê be. Da ku tevayiya rojên salê bibin roja zimanê kurdî, herwiha bang li gel kir ku, li ked û mîrasa heyî xwedî derkevin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Di 15`ê Gulana 1932yan de tevî şert û mercên herî giran Celadet Elî Bedirxan û hevalên xwe kovara yekê ya bi navê Hawar bi alfabeya erebî û latînî lê bi zimanê kurdî derxistin, ji bo wê jî ew roj wek Roja Zimanê Kurdî hat diyarkirin û heta nih jî ev mîras nûnertiya hebûna Kurdan dike. Ji ber siyasetên qirker û hêzên desthilatdar gelê Kurd nikarîbû bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne. Lê piştî şoreşa rojavayê Kurdistanê destpê kir û Rêveberiya Xweser hat avakirin, êdî perwerde bi zimanê kurdî tên dayîn û zarokên di şoreşê de mezin bûyîn giringiya zimanê xwe nas kirin û lê xwedî derdikevin.

Bi pêmana salvegera Roja Zimanê Kurdî, mamosteya zimanê kurdî Necbîr Elî da zanîn ku 15`ê Gulanê roja nasnameya gelê Kurd e. Heriwha behsa giringiya ziman kir û nêrînên xwe ji me re anîn ziman.

**`Ziman hêmeneke sereke ya civakê ye`**

Mamoste Necbîr Elî di serî de Roja Zimanê Kurdî li Rêber Abdullah Ocalan, gelê Kurd û li tevayiya mamosteyên zimanê kurdî pîroz kir û wiha got: Ziman hêmeneke sereke ya civakê ye. Celadet Elî Bedirxan jî dibêje; `ziman ew hêmena ku dihêle civak li ser lingan bimîne`. Wek gelê Kurd di nava dirêjahiya dîrokê de em rastî gelek qirkirin, bişaftin û polîtîkayên desthilatdariyê hatine. Ji ber wê jî gelê ku di bin hakimiyetê de be û desthilatdarî li ser bê kirin, ji bo ku neyê bişaftin û tinekirin, divê xwedî li zimanê xwe derkeve. Çimkî bi riya zimanê xwe wê karibe li dijî hêzên desthilatdar bisekine û çand û hebûna xwe biparêze. Herwiha Ji bo ku mirov karibe derbasî nava civakê bibe, pêwîst e zimanekî wî hebe. Da ku karibe bi derdora xwe danûstandinê bike.

**`Kovara Hawar ji bo Kurdan şoreşeke mazin bû`**

Necbîr Elî di berdewamiya axaftina xwe de bîr xist ku Roja Zimanê Kurdî bi riya kovara Hawarê hatiye diyarkin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: Yekem kesê ku alfebeyeke latînî xweser bi Kurdî nivîsand Celadet Elî Bedirxan bû. Wê demê tevî şert û mercên herî zehmet Celadtet di 15`ê Gulana 1932`yan kovara Hawarê bi




erebî û latînî lê bi zimanê kurdî derxist. Alfebe jî ji 31 tîpên kurdî pêk dihat. Ji ber wê jî 15`ê gulanê wek Roja Zimanê Kurdî hat diyarkirin û her sal tê pîrozkirin. Ji bo wê jî kovara Hawar ji bo Kurdan şoreşeke mezin bû. Heta roja îro jî bi hezaran pirtûk, kovar û rojnameyên bi zimanê kurdî tên derxistin. Ev tev li keda Celadet Bedirxan û hevalên wî digere. Niha jî em bi ked û mîrasa van kesan bi zimanê xwe dinvîsin û diaxivin.
Necbîr behsa wateya zimanê dayîkê an jî yê zikmakî kir û got, zimakê dayîke ew zimanê ku zarok bi dayîka xwe re pê diaxive û axaftina xwe wiha domand: Dema ku zarokek tê dinyayê bi demê re fêrî axaftin, guhdarkirin, xwendin û nivîsandinê dibe, di vê demê de pêwîste malbat rola xwe baş zanibe û ji zikmakî ve zarokên xw fêrî zimanê wan bikin. Çimkî mirovê ku bi zamanê xwe yê dayîkê biaxive gelek ferq û cûdahiya wî ji mirovê ku bi zimanê xwe naaxivin heye. Ji bo wê jî divê malbat li zimanê zarokên xwe baldar bin û ji wan re bibin pêşeng.

**`Dibistana rejimê ji bo Kurdan weke zindanê dû`**

Necbîr bal kişand ser rewşa zimanê kurdî û xwendinê li dibistanên bakur û rojhilatê Sûriyê berî şoreşa Rojava û piştî wê û wiha dirêjî da axaftina xwe: Berî ku şoreşa Rojava dest pê bike axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî ji hêla rejima Sûrî ve qedexe bû. Kurdên me zehmetiyan di vî alî de pir dikişandin bi taybetî zarok, di malê de heta ku dibûn şeş salî bi kurdî diaxivîn, lê piştî ku derbasî dibistanên rejimê dibûn ji wan re qedexe bû ku bi kurdî biaxivin. Dema mirov derbasî dibistanê dibû jê re digotin ev mala te ya duyem e. Mixabin ji bo me Kurdan ne mala duyem bû, weke zindanê bû. Piştî ku şoreş hat lidarxistin bi sedan dibistan û zanîngehên kurdî hatin avakirin û bi hezaran mamosteyên zimanê kurdî çîbûn, êdî zarokên me rastî zehmetî û pirsgirêkan nayên û xwendina xwe bi zimanê dayîkê



dibînin. Herwiha li kêleka zimanê xwe fêrî zimanê biyanî jî dibin. Çiqas mirov fêrî zimanên din dibe ewqas bingehê wî xurt dibe. Ji ber ku cihê em lê dijîn gelek pêkhateyên din lê hene. Lê divê mirov zimanê xwe asas bigre û tê de kûr bibe.

**`Divê em giringiyê bidin zimanê dayîkê`**

Necbîr Elî got, eger ziman nebe zimanê perwerdê wê demê ew ziman tê qirkirin û wiha pê da çû: Zimanê ku perwerdê pê neyê dayîn her ku diçe ew ziman teng dibe û dewlemend nabe, ji ber wê di dawiyê de tê tinekirin. Ji bo wê jî divê em di milê perwerdeyê de xwe hê zêdetir pêş bixin û giringiyê bidin zimanê xwe. Herwiha em xwedî li mîrasa Celadet Bedirxan û hevalên wî û riya wan dewam bikin. Pêwîst e zimanê kurdî ne zimanê perwerdê tenê be, yê bazarê, danûstandinê û yê civakê be.

**`Li ked û mîrasa heyî xwedî derkevin`**

Mamosteya zimanê kurdî Necbîr Elî di dawiyê de got, tevayiya êrişên ku niha tê kirin bi armanca qirkirin û tinekirina zimanê dayîkê ne, çimkî ziman were qirkirin wê demê ti wateya mayîna me jî namîne. Ji bo wê jî bang min ji gel re ew e ku, li ked û mîrasa heyî xwedî derkevin. Herwiha got, ne 15`ê Gulan tenê, pêwîst e tevayiya rojên me bibin roja zimanê Kurdî.

# Malbatên girtiyan li ber Girtîgeha Kiriklarê banga şiyariyê kirin

**Malbatên girtiyan li ber Girtîgeha Kiriklarê li hev civiyan û banga şiyariyê li raya giştî kirin.**

Malbatên girtiyên nexweş û girtiyên ku infaza wan hatiye şewitandin û nayên berdan, di li ber Girtîgeha Kiriklarê ya Îzmîrê ya Tirkiyê li hev civiyan. Malbatan, pêşmalkên li ser wan "Ji girtiyên nexweş re azadî" nivîsandî li xwe kirin û dowîzên "Bêdeng nebe û nebe hevparê sûc ji girtiyên nexweş re azadî" û "Bila girtiyên nexweş bên berdan" hilgirtin.

**'WÊ EV ZILM HETA KÛ DERÊ BIDOME?'**

Dayika Firat Yagmekan ku li Girtîgeha Kiriklarê girtî ye Sûltan Yagmekan axivî û diyar kir ku ji bo kurê xwe û hemû girtiyan li ber girtîgehê ne û got: "Girtiyên ku înfaza xwe temam kirine divê demildest bên berdan û di bin çavdêriya malbatên wan de tedawiyên wan bên kirin. Li girtîgehan her roj mirin hene. Em vê qebûl nakin. Em dixwazin ku hemû sazî û dezgehên hestiyar piştgiriya me bikin. Weke malbatên girtiyan em bi şev jî ranekevin. Xwarinê nadin zarokên me. Wê ev zilm heta kuderê bidome?"

**BANGA LI WEZARETA `DADÊ`**

Yagmekan, ji bo zextên li girtîgehan bi dawî bibin bang li Wezareta Dadê kir û ev tişt got: "Zarokên me jixwe di girtîgehan de ne, çima ev zilm tê kirin? Li girtîgehan ne edalet, ne wijdan ne jî wijdan maye. Em nax-




wazin darbest ji girtîgehan derkevin. Heta ku zarokên me li girtîgehan bin, em kesek tenê jî bimînin em ê li her derê têbikoşin."
***ANF***



## Şeva Çaran û Şerê Tunêlên Kato

**Faruk Sakik**

Dema rûpelên dîrokê 12'ê Îlona sala 1980'yî nîşan dida,li Tirkiyê di bin fermandariya Kenan Evren de darbeyeke leşkerî pêk hatibû.
Di sala 1980'yan de PKK li her derê Kurdistanê hem ji aliyê gel ve û di heman demê de ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve hatibû nasandin. Û dîsa di wan deman de, bi darbeya 12ê Îlonê dixwestin ku vê tevgerê di hundir de bifetisînin. Û wisa kirin, piştî 12'ê Îlonê erişên li dijî PKK'ê dest pê kirin û li zîndana Amedê ji bo tasfiyekirina vê tevgerê planên xwe yên taybet xistin meriyetê.

Bi hatina Esat Oktay Yildiran li zîndana Amedê pêvajoyeke nû dest pê kir. Êşkence di asta herî hov de bû. Ne li cîhanê û ne jî di dîroka mirovahiyê de emsalê vê êşkencê tune bû. Di dîrokê de êrişên wiha yên li dijî rûmeta mirovan pirr kêm bû. Girtîgeha Amedê ji aliyekî ve veguherîbû mekanê xiyanetê, ji aliyekî din ve jî, bûbû fabrîqeya êşkence. Ji bo sekinandina vê hovîtiyê di Newroza 1982'an de Mazlum Dogan starta berxwedanê dabû.

Mesaja çalakiya Mazlûm Dogan gihîştibû kogûşa 33'yan û li vê derê amedekariyek ji bo berxwedana nû dest pê kir. Ji vê yekê re jî Ferhat Kutay pêşengî dikir. Ferhat li hin hevalan digeriya di demek wiha di her çiqas bawerî anîn zehmet bû jî Ferhat piştî çavdêriyek dem dirêj bi Eşref Anik, Mahmût Zengîn û Necmî Oner re ketibû dewrê û dest amadekariya çalakiyê kir.
17'ê Gulana 1982'yan Amed

Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Mahmut Zengîn ve Necmî Oner, di zîndana Amedê de li hemberê êşkenceyan û daxwaza cûntaya 12'ê Îlonê ku dixwest gelê kurd di kesayetiya komeke êsîran de bêdeng bike agir bi bedena xwe xistin.

Çar kesan, di 17'ê Gulana 1982'yan de de di koşeyeke tarî ya kogûşa 33'yan de agir bera bedena xwe didin û yek ji çalakiya herî mezin a dîrokê li dar dixin.

Çalakiya Çaran asta berxwedana zîndanê bilind kir, wê riya çalakî û berxwedanên ku wê di mehên bê de bên lidarxistin ronî bikira…

PKK rihek wiha ye di her şert û mercî de reyeke çareseriyê dibîne. Rê û rêbazên berxwedanê diafirîne.

Piştî Çaran 40 sal şûn de, li Tunêlên Şer ên Kato de 5 leheng, 5 pêhlewan, 5 qehreman, 5 gerîla di 53 rojan de kêlî bi kêlî bi dijmin re şer dikirin. 5 şervanan, tam 53 rojan li hemberî dagirkerên hov berxwedaneke bê hempa dane; mil bi mil, sing û sing. 53 rojên her kêliya wê, her gava wê, her saeta wê, her roja wê weke efsûnekê derbas bûyî. Li hemberî gaz û kîmyasalê têdikoşiyan. Berê tu perwerdeyeke bi vî rengî negirtibûn. 53 roj şûnde dema ku rizgar bûn Şehîd Şoreş Karer di hevpeyvîneke xwe de digot: "me bawerî bi fikir û ramanên Rêber Apo anî bû. Tu kêliyek em teslîmî gaza kîmyevî nebûn"

Tenêarmanceke wan gerîlayên ku weke zinareke rê naçiyê li hemberî artêşa tirk a hov sekinîbûn hebû: wan li ber xwe dabûn û gavekê şûnde neçûbûn. Dema lazim bikira wê wan sing û sing şer bikira, têketana nava dijmin û ew têk bibirana, lê belê wan çeperên xwe bernedidan. Ewan gotina Mazlûm Dogan a digot "teslîmiyet mirovî dibe xiyanetê, berxwedan ji dibe serkeftinê" kiribûn guhar û kiribûn guhê xwe. Li gorî wî jî tevgeriyabûn û bi ser ketibûn.
Çaran jî di sala 1982'an de peyama Mazlûm Dogan a "teslîmiyet mirovî dibe xiyanetê, berxwedan ji dibe serkeftinê" girtibûn û bi ser ketibûn. Piştî şehadeta wan rihê berxwedanê li zîndanê belav bû. Derbasî çiya bû. Li çiyayê Kato di tunêlên şer de, şehîd Şoreş Karer ev peyama Çaran a 40 sal berê girtibûn.